Ne 3 demjimêr, lê nêzîkî meh û nîvekê ye ku dagirkeriya Tirkiyê hêj tişteke berbiçav bi dest nexistiye û bi dest naxe jî.

Ji kurdan pê ve, Efrîn nabe bermaliya tu kesî. Ji vê yekê zêdetir; eger kurd bixwazin ku bidin jî, lê zilhêzên cîhanê Efrînê nadin Tirkiyê.

Jixwe eger qada asîmanî ji Tirkiyê re venebûba, dê yek gavî bi pêş ve neçûya û qurbaniyên wê bi deh qatan zêdetir bûna.

Eger yekrêziya hêzên kurd ên navxweyî pêk were, dê bandoreke din a erênî li berxwedana Efrînê bike.

Berxwedana Efrînê derfetek bû, bo yekrêzkirin û parçîmkirina lutkeya siyaseta kurdan bi awayekî gelemper. Lê mixabin hetanî aniha keys ji vê derfetê nehatiye înan...

Tenê bi qehremanî û lehengiya jin û mêrên Efrînê, dê Efrîn nikaribe bi ser bikeve. Divê ku hemî hêz û aliyên siyasî nakokiyên xwe bidin aliyekî, û ji hevûdin re palpişt bin. Îro ez û sibe tu...

Aniha hêzên rêjîma Sûrî jî derbasî Efrînê bûne û diyar e ku êdî rewş ber bi qonaxeke nû ve diçe; dê rûdêmên evê qonaxê, di nêzîktirîn dem de xuya bibin.

Hêvîdar im ku qedera Efrînê, ne mîna ya Kerkûk, Xaneqîn û Şengalê be.

Mehabad û Kerkûk...Li Efrînê Dubare Dibin

Bûyera ku li Kerkûk û Mehabadê rû da û tiştên ku li her du serbajarên Kurdistanî qewimîn, îro li Efrînê dubare dibin.

Dema ku meriv van her sê bajarên Kurdistanî bide ber hev û baş rewşê bixwîne, êdî bi awayekî zelal rastîyek derdikeve holê: Çawa ku Mehabad û Kerkûk bûn qeurbanên rêkeftinên navnetewî, heman dek û dolab li ser Efrînê jî geriyan...

Ji beriya 72 salan û piştî ku berpirsên Yekîtiya Sovyetê bi dehan soz û peyman dan serwerên kurd û tekezî li ser wê yekê kirin ku dê ji milên siyasî û leşkerî her duyan ve palpiştiya evê komara nûavabûyî (Komara Kurdistan – Mehabad) bikin, lê bi encama rêkeftinekê, Sovyetê hemî sozên xwe beravêtî kirin.

Peymana ku wê demê di navbera Îran û Yekîtiya Sovyetê de çêbû, ev bend vedihewand: Dê berpirsên Sovyetê ji Mehabadê derkevin û bi yek carî têkiliyên xwe li gel kurdan bibirrin. Li beramber evê yekê, dê Îran tevahiya Azerbîcanê bi hemî samanên wê yên binerd ve pêşkêşî Stalîn (Joseph Vissarionovich Stalin) bike.

Bi heman şêweyî; îro tirkan soz ji Rûsyayê stand da ku derbasî Efrînê bibin. Li beramber vê derbasbûnê dê Rûsya boriyên xaza "sîal" di xaka Tirkiyê re bigihîne Deryaya Sipî. Bi vê yekê Putîn leşkerên Rûsî ji Efrînê kişand û Efrîn pêşkêşî Erdogan kir.

Hêja ye mirov bibêje ku Erdogan bajarê Idlibê jî di vê rêkeftinê de kir qurbanî.

Zêdetir ji mehekê ye ku artêşa Tirkiyê û komikên rikberiya Sûrî yên çekdar bi tundî êrîşî Herêma Efrînê dikin, lê belê tu encam bi dest nexistine. Bi berxwedana xwe, şervanên Kurd hebûna kurdan diparêzin û nahêlin ev pîlanên qirêj li devera Çiyayê Kurmênc cî bi cî bibin.

Mixabin, Amerîka ta aniha bi tenê dilgiraniya xwe nîşan daye û tu helwesteke piştgîriya kurdan

Beha'edîn Şakir

raber nekiriye. Amerîka xemxwara jinavbirina DAIŞê ye û kurdan wekî destek bi kar tîne.

Di bûyera dagirkirina Kerkûkê de jî Amerîka di bêdengiyê de ma û heman helwest nîşan da.

Amerîka wê hingê got: "Ez ne alîgira tu aliyan im û ez destê kesekî nagirim, ji ber ku ev pirsgirêkeke navxweyî ye".

Di her heft salên borî de, me dît bê çawa di meydana siyaseta navnetewî û herêmî de, gelek welat û serokan helwestên xwe guhertin û berjewendiyên miletê xwe dane pêş.

Mixabin ta niha û tevlî ku ji çiyayan pê ve kesekî kurdan tune ye jî, lê belê kurdan helwesta xwe hêj neguhertiye û berjewendiyên xwe nedane pêş. Ev yek di demekê de ye ku Efrîn sedema herî girîng e ku kurd li hev vegerin û li hember rêkeftinên dijminan hebûna xwe biparêzin.

Daxwaza her kurdekî jî ew e ku îro tevahiya hêz û aliyên siyasî li gorî xwestekên demê helwesteke êkgirtî destnîşan bikin.

Di siyasetê de li gorî berjewendiyên welatan, helwest jî tên guhertin. Ya herî rast ew e ku hêzên kurdî xwendineke hûrbîn ji rewşê re bikin û tevegera tevahiya Sûriyeyê li ber çavan bigirin, da ku strateciyeke nû ji bo qonaxeke zor û giran amade bikin.

Gotina ku dibêje: "Tişta ku kurd di şer de bi dest dixin, di siyasetê de winda dikin" gerek e naveroka wê were pûçkirin û ev gotin ji koka xwe ve ji holê bê rakirin...Hêvîdar im ku demek were û gotina "Tişta ku kurd di şer de bi dest bixin, dê di siyasetê de zevt bikin" cî bi cî bibe.

www.buyerpress.com
buyerpress buyerpress1
buyerpresss@gmail.com
Whats App00963992238683
bûyer PRESS
Nûçe... Bi Zelalî

Fermandar û Nivîskarê Kurd Polat Can: “ Min tenê dikarîbû şervanî bikira, lê min fêm kir ku şervaniya herî mezin ji bo kurdan, hilgirtina PÊNÛSê ye”

Jiyana di nava çiya û xwezaya Kurdistanê de, asoyên afirandin û behremendiyê ji xudanê her pîşeyekî re berfirehtir dike. Şervanekî şoreşger, li lutkeya çiyayên Zagrosê, li raserî gelî û newalên bisaw û li ber bayê buharê; peyv û bêjeyên xweş li hev civandine, da ku bi rewanbêjî û bi zimanekî petî hestên xwe derbibire.
Polat Can, di 1980’yî de li Kobana Rojavayê Kurdistanê ji dêya xwe bûye. Di destpêka salên ciwaniyê de tevlî tevgera azadîxwaziya Kurdistanê bûye. Polat yek ji damezrînerên Yekîneyên Parastina Gel e. Ji 2011’ê ve û hetanî îroj, li Rojavayê Kurdistanê dixebite. Hejmarek ji navend û dezgehên ragihandinê li gel hevgirtineke xwendekaran ava kirine. Nivîskarê şervan Polat Can li pirî deverên Kurdistanê geriyaye û di nava civaka her perçeyekî Kurdistanê de jî jiyaye . Bi zimanên kurdî, erebî û farisî dinivîse. Her berhemeke wî, naverokeke cihê vedihewîne; wekî: dengbêjî, helbest, serpêhatî, pexşan, ziman û hwd...
Sernivîskariya gelek rojname û kovarên kurdî kiriye û di gelek rojname û kovaran de jî nivîsiye.
Bi rêya evê hevpeyvîna ku li Qamişloyê pê re hatiye kirin, bawerî û şîroveyên Polatî bixwînin.

Hevpeyvîn: Ferîd Mîtanî

-Babeta şervanî û nivîskariya te bi hevûdin re, bala mirovan dikişîne. Di atmosfer û seqaya şer de, tu çawa şervanekî nivîskar ji me re pênase dikî?
Gelê kurd gelek bûyerên cihêreng bi serê wî de hatine; çi bûyerên qehremanî û trajedî bin, çi jî bûyerên ku qet hemtayên wan li dunyayê tune ne bin. Lê mixabin edebiyat û dîroka gelê kurd herî zêde ji aliyê kesên biyanî ve hatine nivîsîn, an jî ji aliyê neyaran ve hatine nivîsîn. Ji bo ku em bikaribin dîroka xwe binivîsin, pêwîst e kesê ku evan kêlî û bûyînan dijî, bi xwe binivîse. Ji zaroktiya xwe ve ez di vê baweriyê de me.
Dema ku tevlî şoreşê bûm û wekî şervanekî tevgeriyam, gelek bûyer, çîrok, serpêhatî, ken, bilindbûyîn, êş, berxwedan, serkeftin û qehremanî rû dan. Êdî min pêwîstî bi wê yekê dît ku tevahiya van tiştên navborî binivîsim, da ku ji kesên nedîtine re veguhêzim; da bizanin me çi kiriye? Em çawa jiyane? Gelo şoreşên Kurdistanê tenê hilgirtina çekê ye?
Ez bi vî rihê berpirsyariyê nêzîkî mijarê bûm. Min tenê dikarîbû şervanî bikira, lê min fêm kir ku şervaniya herî mezin ji bo kurdan, hilgirtina PÊNÛSê ye.

Min dixwest ku hestên şervanekî kurd ku di şer de dijî, binivîsim

-Ta çi astê te kariye dîmenê bûyîn û kêliyên kêmpeyda zevt bikî û bi xama pênûsê li ser pelê bi cih bikî?
Ez nikarim bibêjim ta çi astê, lê helbet em wekî kurd di milê nivîskî de pir kêm in. Em ne di asta tê xwestin de ne. Ez wekî şoreşgerekî kurd ku ji bo azadiya Kurdistanê ev qas sal ji temenê xwe terxan kiriye, ez dibînim ku tişta min di aliyê nivîskî de kiriye kêm e û çendî mirov bike, hêj kêm e.
Min dixwest ku hestên şervanekî kurd ku di şer de dijî, binivîsim. Dibe ku endamekî civaka kurd bibêje ku hema ev şervan însanekî ku çek hiligirtiye û çûye. Lê tenê ne wilê ye, ev şoreşek e. Şoreş bi xwe jiyaneke tekûz û kamil e. Di şoreşê de: evîn, qehremanî, bêrîkirin, êş, cudabûyîn; hezkirina kevir, çem, robar, ax, dar, fêkî, gul û pezkoviyên welat hene.
Dibe ku pirî caran jî pênûs û lênûskek peyda nedibûn ku meriv fikrekî binivîse.
-Tişta ku nivîskarekî şervan ji yekî sivîl cuda dike, çi ye?
Cudahiyeke pir mezin tune. Cudahî ew e ku: Nivîskarek bi rêya xeyala xwe dinivîse yan jî guhdar kiriye û dinivîse. Û nivîskarekî ku ew kêlî jiyan kiriye û di kûrahiya hestên xwe de hîs kiriye, dinivîse.
Kêliya ku berî tiving biteqe, dema ku tu di nava daristanên Kurdistanê de dimeşî û bêhna axê li pozê te dixe, gava ku tu wan gulên pirreng bêhn dikî; ancex tu van kêliyan bijî, da ku bikaribî rastî û dîmenên heyî binivîsî.
-Di vê şoreş û têkoşînê de şervanê ku bûye xwediyê çekeke azad, gelo bûye xwediyê pênûseke azad jî?
Pênûs bi xwe têrê nake; lê mejî û dilê ku pênûsê dide xebitandin, ew girîng e. Gelek kes hene ku pênûsa xwe xistine di xizmeta nokertiya dijmin de, an jî xistine di xizmeta çewisandin û pişaftina gelê xwe de.
Divê ku kesê şoreşger bibêje: Em ê bi çek û pênûsa xwe vê qederê biguherin. Divê ku em mejiyekî biafirînin ku jê re bibêjin ev ne qedera te ye ku tu bindest bimînî û neteweyên din ji te mezintir bin. Ev ne qedera te ye ku tu her timî peyayê xelkê bî. Wê hingê ew mejî dikare hem pênûs, hem jî tivingeke baş bide şixulandin.

Kerepêtê Xaço ji min re got: “Hûn kurmanc qîmetê dengbêjên xwe nizanin, hûn qîmetê insanên xwe nizanin”

-Te û H.Kerepêtê Xaço hevdîtin û suhbetek bi hev re kiribû. Di wê rûniştina we de, helbet kêmzêde we pelên rabûrî û dîrokê pelandin. Kerepêtê Xaço çi digot?
Hevdîtina min bi Kerepêtê Xaço re, jiyana min guherand. Ez jî wekî hemî hevdemên xwe, bêhtir bandora sitranên modern û nûjen li min bûbû. Mixabin, pir caran ez ji dengbêjiyê aciz dibûm; mînak: Ez çûm gundekî min dît ku civatek li sitranên Baqî Xido guhdar dike. Ez jî aciz bûm û min got: “Ev çi ye hûn lê guhdar dikin!? “. Îcar kalekî ereb li civatê bû, lê belê zêdetir ji bîst salan di nava kurdan de mabû, ji min re got: “Xwarzê, hûn gêncên kurdan pêwîst e qîmetekî mezin bidin van dengbêjan, eger hûn qîmetê nedin wan, hûn ê biçin, bihilin”. Wê demê min tu wate neda gotina wî.
Piştî 10 – 15 salan, di 2002’yê de carekê li Êrîvanê bûm û ji min re gotin ku Kerepêtê Xaço heye. Min navê wî bihîstibû, lê min ew nedinasî.

Kerepêtê Xaço dengbêjê sedsalê ye. Dengê wî pir xweş e. Şakiro, dengbêjekî pir biqîmet û naskirî ye. Mixabin, piştî ez çûm Êrîvanê min Baqî Xido keşif kir. Min li Êrîvanê nameyek ji Baqî Xido re hinart, lê belê bersiva min neşiyand, ji ber ku wê demê “Serhildana Qamişlo” li dar bû û ew xortên ku nameya min bi xwe re birin Rojavayê Kurdistanê, hatin girtin.
- Di dema îroyîn de, gelo li şûna dengbêjîyê navgîn û alaveke din peyda bûye ku dikare bigihîje kûrahîya raz û nepenên ziman, an jî tu navgîn nikare sitûbariya dengbêjiyê awayekî ferhengzanî.
Di babeta zayenda navan de jî, hin nav hene li cihinan ji bo keçan, li cihine din jî bo kuran tên bikaranîn. Ji lew re me biryar da ku em di pirtûkê de zayendê nenivîsin. Bila her kes li gorî muzîka ewî navî û li gorî zewqa xwe ji hev cuda bike.
- Ji wan 6800 navan, herî zêde kêfa te ji kîjan navî re hat?
Gelek navên xweş tê de hene û yên kêfa min ji wan re tê, navên wekî: Barîn, Berfîn, Zîn, Rabûn,Nûbihar û Şeyda ne...

Cihê nivîskar û reweşnebîran di nava civakekê de, wekî cihê pêxemberan e.

- Ev çend sal in ku tu ji civata rewşenbîr û nivîskarên Rojavayê Kurdistanê nêzîk î. Dengê behane, gilî û gazindan ji nava vê civatê bilind tê bihîstin. Ji bo nivîskarekî, tu ve yekê çawa dibînî?
Li gorî min cihê nivîskar û reweşnebîran di nava civakekê de, wekî cihê pêxemberan e.
Rewşenbîr an jî nivîskar, dibin wekî mûm û findan û rêya neteweyê xwe ronak dikin. Ji navê xwe jî diyar e; anku wekî mûmekê ye û da ku civaka wî bikaribe di rêyeke ronî de bi rê ve biçe, ew jî dihile.
Mûm nikare gazindan bike û bibêje ji ber çi ez dihilim? Jixwe erk û peywira mûmê ew e ku bihile û ronakbûnê çêbike. Eger ez neşewitim û tu neşewitî, kî yê rêya me ronî bike?
Rast e guhdana bi rewşenbîrên kurd ne di asta ku tê xwestin de ye û ev cihê rexneyê ye, lê gerek e li bendî vê jî nemînin. Wezîfeya nivîskar ne ku gazindan bike, wezîfeya wî ew e ku êşên heyî bi rengekî wêjeyî û fêmkirî bîne ziman û jê re çareyan bibîne.
Yê ku divê gazindan bike, miletê kurd e. Çima nivîskarekî kurd ê cîhanî îro tune? Çima Ehmedekî Xanî di roja îroj de derneketiye?

Roman û kurteçîroka kurdî li nava kurdên Sovyetê li pêş ket

- Ji serdema “Kovara Hawarê” ve û hetanî wekî aniha, pirî nivîskarên kurd ji helbestê dest pê dikin û êdî di nivîskariya xwe de ji bilî helbestê tiştekî din nanivîsîn. Sedemên vê yekê çi ne û tu çawa vî dîmenî dinirxînî?
Helbet ev kêmasî ye. Gelek caran dibêjin “nivîskarê kurd”, lê ez dibêjim “helbestvanê kurd”. Helbest tiştekî xweş e, lê hêsan e. Ji aliyekî din ve jî kurdên Rojava bi ereban bandor bûne; ereb qehremanên axaftinê ne û tê de pir zîrek in.
Roman û kurteçîroka kurdî li nava kurdên Sovyetê li pêş ket.
Kurdînî û wêjevanî ne tenê di helbestê de ne, helbest tenê beşekî wêjeyê ye.
Gelek ciwanên Rojava hene, evîn û hezkirinekê dijîn, dîwaneke helbestan çap dikin û çawa ku dizewicin û dikevin nava rastiya jiyanê, êdî dest ji nivîsînê berdidin. Ev ne nivîskarî ye, ev bayek bû li serê wî xist û hew. Nivîskarî berdewamî ye.
- Eger li pêşber te, çek û pênûs bêne danîn, tu yê kîjanê hilbijêrî?
Yeke tenê nabe, min tu caran xwe nekiriye di navbera du bijardeyan de.
Gelek kesan ev yek da pêşiya min, lê min nivîskarî û şervaniya xwe bi hev re dikir.
Ez nivîskarekî şoreşger im. Belku çek heta hetayê nebe, lê dê nivîskarî her timî hebe.
- Qehremanê te kî ye?
Qehremanê min ew kes e yê ku di demekê de ku hêvî qet tune bû, her kesî digot êdî her tişt çû, lê ew kes derket û got “ez ê tiştekî ji bo vî gelî bikim”; qehremanê min ew e. Qehermanê min ew e yê ku di demekê de hêvî tune be, gotiye ez heme.
- Gotina herî xweş?
Eger hêvî hebe, her tişt dibe.
- Gotina herî ne xweş?
Ez nizanim. Ez nikarim. Ez naxwazim.
- Hevpeyvîna me qediya. Sipasiya cenbaê te dikim ji bo dana evê derfetê...
Em sipasiya we dikin ku bi rêya rojnameya we me karîbû beşekî biçûk ji axaftinên xwe bigihînin miletê xwe. Her timî li ser şopa evê rastiyê bin, her timî gelê me ronî bikin.

www.buyerpress.com
buyerpress buyerpress1
buyerpresss@gmail.com
Whats App 00963992238683
bûyer PRESS
Nûçe... Bi Zelalî

Jiyan Bi Kurdî Xweştir e

Şêro Dalînî

Wek ku tê zanîn, muzîk zimanê cîhanî yê yekem e. Di muzîkê de tu dikarî pareke mezin ji çand û kelepûra civakekê bibînî û di stran civakekê de asta têghiştin û pêşketina wî miletî xwe dide pêş. Jixwe di dema dawî de muzîk bi serê xwe wek ku derman ketiye di nava lîsteya dermanan de; li nexweşxaneyan ji bo kesên ku derûniya wan nebaş be tê bikaranîn. Ango muzîka nerm û nazik û ya ku rîtma wê bi kut-kuta dil re be, aramiyê dide yê guhdarvan.

Ev tê wê wateyê ku zarok jî wek mezinan heman sûdê ji muzîkê digirin. Aflatonê fîlozof di gelek nivîsên xwe de girîngiya muzîkê di jiyana zarokan de diyar dike. Ango muzîk di avakirina mêjiyê zarokan de dibe alîkar û her wiha sitran nahêle ku tu xwe ji bîr bikî.

Her kes dizane ku muzîk û sitrana kurdî li hember planên dagirkerên axa me kurdan ta radeyeke gelekî mezin zimanê me ji windabûnê parastiye, ne tenê parast, lê belê pêşxistin jî ji xwe re kiriye bar.

Em kurd li her çar parçeyên Kurdistanê, hebûna me bi serê xwe ji dagirkeran re armanc e, ji bilî vê yekê jî, sitrana kurdî hat wergerandin û muzîka wê jî pê re hat dizîn. Aniha ew sitran û muzîka wê nema kurdî ye, estromentê me ji xwe re kirin kevneşopî û kelepûr.

Li vir, asta jixwehezkirinê li cem kurdan gerek xwe bide pêş; kurd wek civakeke bindest, çawa dikare xwe bi sitranên xwe ava bike û xwe bi civaka cîhanî bide nasîn?

Kurdên ku li derveyî welat û dûrî civaka xwe dijîn û ji ber ku dixwazin bi derdorê re têkildar bin; zimanê xwe di ser guhên xwe re diavêjin. Bi hêsanî tu yê pêrgî kurdekî ku nizane bi kurdî baxive bibî û di heman demê de çend sitranên kurdî ezber kirine. Ev ew kes e yê ku bi mebesta kar û xwendinê dûrî mala xwe dikeve û bê hemdî xwe dikeve bin bandora zimanên biyan, ango ne yê dayîkê.

Li vir sitran girîngiya xwe dide pêş û ev yek di serî de barê saziyên ku civakê bi rê ve dibin e.

Lê gerek e her malbateke kurd rol û bandora helbest û sitrana kurdî bîne ber çavan.

Sitran bi serê xwe şoreş û berxwedana li hember dagikeriya ku li zimanê me dihat û tê kirin e.

Kanîn Bazên Esîl..?

Dibêjin ku Pêxemberê Xwedê " Suleyman" gazî teyrê baz kir û jê xwest ku cihê herî xweş li ser rûyê erdê bibîne, da ku koçî ewî warî bikin û lê bijîn.

Teyrê baz firek da xwe û ber bi lêgerîna xwe ya li hawîrdorê dunyayê ve tûj ajot. Rojek, du roj, sê roj derbas bûn, teyrê baz bi kêf û şahî vegeriya bal pêxemberê Xwedê û jê re got:

– Ez benî fermo em herin buhişta Xwedê ya li ser rûkê erdê.

Pêxember Suleyman bi rê ket… Giha cihekî wekî gelek cihên ku berî aniha lê jiyabû; tenê goleke avê û çend darên şîn hebûn.

Pêxember li teyrê baz zivirî û got:

– Gelo ev e bihişta ku te digot?

Baz lê vegerand:

– Belê ez benî ! Dibe ku cihine din ji vir xweştir hebin, lê li nik min ev war buhişta dunyayê ye. Ev e cihê ku ez lê ji dayîk bû me!

***

Mebesta min ji vê serpêhatiya jorîn ew e ku em wekî kurdên Rojavayê Kurdistanê hinekî li xwe vegerin û têkiliya di navbera milet û welatan de nas bikin. Kurdistana ku bi buhişta dunyayê tête nasîn, kurdek nîne ku hêj pesnê bedewiya wê nedaye.

Seydayê Cegerxwîn bi xwe jî gotiye:

"Welatê min buhişt e kaniya zêr
Bekê şêr tê de birçî ne gur in têr
Kurên Guhderz û Rustem lê perîşan
Di bin destê neyaran têne ber kêr"

Mixabin, kesên ku evîna evî welatî bi rastî kirine di dilên xwe de ku ev evîn bûye parçeyek ji canê wan, kêm in.

Der barê koçkirina ji welêt, her yek ji me dikare gelek sedeman bîne zimên û gazindên xwe bike. Lê em tev dizanin ku piraniya wan sedeman ne rast in û nabin egera destberdana ji welêt. Nemaze di demekê de ku welatê me bi hewceyî hebûna me ye, pêwîstiya wî bi zend û bendên qîz û lawên evîndar û canfîda heye.

Bê guman, şerê ku bi ser Rojavayê Kurdistanê de hatiye şerekî pir dijwar e. Her wiha evî şerî gelek kirîzên aborî û ewlehî jî bi xwe re anîn.

Lê me qet nebihîstiye û ne jî dîtiye ku di van çend salên şoreşê de hin ji nêza mirine yan jî berî roja xwe hatine kuştin.

Ji beriya demekê min amadekariyên xwe dikirin ku biçim Efrînê da ku li meşekê amade bibim .Diyar e ku di van kêliyan de, Efrînê serkêşiya berxwedana serdemê dike. Çawa ku malbata min pê agahdar bû ku ez ê biçim Efrînê, bawer bikin tenê cenazeyek ji mala me kêm bû.

Min jî wekî rastan, qewêtiyên xwe jî nivîsîn.

Xwişka min li Başûr li ser min digirî. Birayên min bi rêya WhatsAppê name û deng dihinartin: " Qurban, heyran, ji bo Xwedê, ji bo pêxember… tu neçî". Lê ez çûm.

Gelo kanî welatparêzî?

Gelo kanî îmana bi Xwedê?

Welatparêzî ew e ku tu can, mal û zarokên xwe bi gorî welatê xwe bikî. Ev welatê ku di firehiyê de ava xwe, nanê xwe, gul û kukîlkên xwe bê minet û bi kêf û eşq diyarî me dikirin , em ê çawa di tengahiyê de jê biqerin û ew birîndar e?

Ma ez ji wan şervanan çêtir im? Na.

Ma ew şervan bêxwedî ne? Na.

Ma kesê ku canê xwe dike gorî welatê xwe, dîn e? Na.

Nuhman Elî

Cudahiya wan ji min ew e ku ew welatparêz in, lê ez na.

Li aliyekî din, baweriya bi Xwedê ew e ku tu bizanibî yê rih dide ew e

-Xwedê- û yê dibe jî ew e.

Cegerxwîn careke din dibêje:

"Ne pêxember
Ne rêber
Negihan doza xwe
Bê şer"

Lewra divê em kara xwe ji mirinê re bikin, lê jê netirsin, ji ber ku jiyan û mirin ji karîna Xwedan e.

Lê em tu carî dara hêviyan nabirin. Ev dar dê her û her şîn bimîne û saxên wê dê ji hêlînan mişt bin, li benda teyrên kurdî yên baz bin ku vegerin û li ezmanê welatê xwe bi azadî bifirin; bêyî ku tu kes karibe wan basko bike yan jî bîne xwar.

Napoleon: Têkçûn Ji Vir Dest Pê Dike

Rakan Şêxê

Piştî ku Napoleon Ewropa kontrol kir, biryara dagirkirina Rûsyayê da. Dema ku Napoleon ber bi Rûsyayê ve diçû di gelek bajar û gundên Ewropayê re derbas bû. Li wan gund û bajaran milet ji malên xwe derdiket, da ku bi dizî li karwanê Napoleonê Mezin temaşe bike. Dema Napoleon derbasî xaka Rûsyayê bû, rastî cotkarekî Rûsî hat ku dasik di destê wî de bû, û bi çalakî û bê westan paleya xwe dikir. Karwanê Napoleon qet bala wî cotkarî nekişand.

Napoleon ji pasvan û fermandarên artêşa xwe re got:

– Ma hûn vî cotkarê rûsî yê kotî dibînin? Li karwanê min temaşe nake.!

Her wiha got:

– We dît çawa keçên Ewropayê bi hewes ji odeyên xwe yên razanê derdiketin û li pêşiya malên xwe radiwestiyan ji bo ku li karwanê min temaşe bikin..?

Napoleon karwan rawestand û got:

– Vî cotkarî werînin bal min.

Cotkar destgirêdayî jê re anîn.

Napoleon gotê:

– Tu çima paleya xwe ranaweştînî û li karwanê min temaşe nakî ?

Cotkar got:

– Ma min çi ji te û karwanê te ye, xemxwariya pêşîn li ba min xaka min e.

Napoleon got:

–Ma tu nizanî ez kî me?

Cotkar got:

– Tu çi kes bî li ba min ne girîng e.

Napoleon got:

– Divê tu bizanibî ku ez ê welatê te dagir bikim.

Cotkar lê vegerand:

– Tu dagirkerekî çepel û bêrûmet î. Tu qet nikarî welatê min dagir bikî.

Napoleon got:

– Divê tu navê min bi xwe re hilgirî, da ku ez her dem li bîra te bim...

Û ji leşkerê xwe re got:

– Navê min bi sîxekî sorkirî li ser destê wî binivîsin!.

Piştî wê kiryarê, cotkarê rûsî dasa xwe hilda û li destê daxdayî xist. Ew dest birrî û avêt nav leşker û efserên wî, û got:

– Ji te re navê xwe bi xwe re bibe. Şerm e ji min re ku ez navê êrîşkerekî bêrûmet î weke te hilgirim.

Napoleon li kesên derdora xwe nihêrî û ew peyva xwe ya navdar got:" Têkçûn ji vir dest pê dike". Bi rastî jî artêşa Napoleon li Rûsyayê, rastî têkşikandineke mezin hat.

Em jî dibêjin: Mirovê ku bi xaka xwe ve girêdayî be û jê hez bike, bê guman simbilê serkeftinê diçîne û tu carî nakeve.

Parêzera Hebûnê

Xewna hezarên salan, paytexta hêvî û xwestekên bendewar, îro bi tîrêja roja pîroz xemilandî ye. Wekî find û çiraya şevên tarî, riya tiyên zanîn û wêjeyê ronî dike. Wargeha omîdan; Zanîngeha Rojavayê.

Bi zordestî û sitema qedexekirina zimanê dayîkî, mirov korê robinîro ye, hebûn û hestên jiyînê jê tên birîn; vexwarina ji kaniya Cizîrî, Feqe, Xanî, Herîrî û CegerXwînan radiweste, baran jî ji barîna dilopên bişkevandî radiweste û hebûn bênasname dibe.

Xwînkar û mijokên gencîneya wêjeyê, bi salên ku nayên hejmartin em jê bêpar dihiştin, ji xwe re dikirin saman û ji xwedanên wê yên resen didizîn; navê xwe tê de digotin, dikirin a xwe û belav dikirin. Li ber çavên me, talan û wêran dikirin û em bi gotinên hingivîn dixapandin. Jibîrkirina wê bi me, ji xwe re kiribûn armanc, ji tehlkirina wê li ber çavên me teqez bûbûn.

Bi rijîna xwîna pak, avakirina nifşên pêşerojê dest pê kir. Zimanê zikmakî li bexçe, kolan û dibistanan hat axivîn, li ber deriyê zimanên zindî, serî ra kir û doza derbasbûnê kir. Weke mala ji binî ve bê avakirin, kar û xebateke bêhempa û bilez û bez hate meşandin. Di bin sirûda "Ey Reqîb" de soza nûvejînê hate dayîn û pirpirîkên rengîn, nîşanên serkeftinê bilind kirin.

Li ber dengê daholên ceng û şoreşê, biryara vekirina seraya perwerdeyê hate ragihandin. Êşdarên vî derdî mizgîniya vê nûçeyê dan, Osman Sebrî û Celaldet Bedirxan di gora xwe de bi şanazî, aram û piştrast xwe spartin xewa sermedî. Va ye xewna wan pêk tê û pêpelûka yekem derbas kir .

Xemxwerên vî zimanî bi karwanên bêrawestîn tomarkirina xwe dan destpêkirin. Ew roj hat û xwendina qonaxa yekemîn dest pê kir. Qelem û deftera ji bo nivîsîna tîpên zêrîn bi meraq û dilxweşî amade bûn, roja em li bendî bûn hat .

Weke mirov li tiştekî xwe yê windayî bigere, weha li me hatibû. Xewa şevan li me nebû, me bawer nedikir kengî roj here ava ku em careke din berê xwe bidin seraya hêviyên xwe, bi çêja jîna nû û zelal hîs bikin , çawa xwe di ziravî û hûrgiliyên wê de kûr bikin û ji ava kaniya ku naçike têr vexwin.

Hevaltî xeleka windayî tekûz dike, neynika jiyana rast bi me dide nasîn, li wir ev xeleka windayî tê dîtin. Li wir pirs û bersivên destpêka gerdûnê peyda dibin. Xwenasîn li wir dest pê dike.

Zimanê windayî û mûma vemirî li wir jîndar dibin, pûtedana bi rizgarkera gelan li wir tê kirin. Di nav pelên pirtûkên bi vî zimanê pîroz de, zengînbûna wî xweş dixuya, dizên razên hebûna me tên kifşkirin û dîlana têkiliyên rasteqîn li wir germ dibe.

Wane li pay waneyê, xurtbûna me li ber çavan diyar dibe, bi mamostеyê perwerdekar, hînkirina nifşekî azad û welat-

Raman Hesê

hez misoger dibe. Bi vê gotinê, vîna dewamiya me her roj xurtir dibe. Vejandina zimanê piştguhkirî li Zanîngaha me xwe dide der. Di dema berveçûyîna ewrê reş û tarî bi ser vî zimanî de, Zanîngeha Rojavayê li sînga xwe xist ku vî gelî bîrewer, zana û hişmend bike. Pira rizgariya ji windabûnê ye.

Dîroka nûzayînê ji vê zanîngehê dest pê dike, soza geşkirina hebûnê hatiye dayîn, zembîla wê ji zanîn û wêjeyê tijî ye û rawestîna hizirê dijminê wê ye. Hêviya me pê heye û teqez dê li gorî soz û peymanên pêşxistin û ronîkirina rêya vî gelê bextewer bi zimanê wî yê serfiraz be.

Nivîsên ku tên weşandin, nerînên xudanên xwe ne.

www.buyerpress.com
buyerpress buyerpress1
buyerpresss@gmail.com
Whats App00963992238683
bûyer PRESS
Nûçe... Bi Zelalî

Helbestine Bijartî...Ezîz Xemcivîn

Amûdê...

Strîzerkê,
Guhdarê banga evîna te me...
Isamyîl dîn û Heyindroyê te
keleha can min ava kirine...
Ez ê bi axa te destnimêja Kurde-
wariya xwe bigirim.
Tu azad çêbûyî,
Tu azad î,
Tu dê her û her azad bimînî...

Neviya Rojê..

Strana Henaseyên min..
Bi awirên azadiyê
Bêtir xaka dilê min nîgar bike..
Bendewar im,
Ta ko Destê te
Ala evîna me li Çiyayên
Kurdistanê bilind bike..

Yara Gulgulî

Silava Sibehê Efrînê
Çavan veke û bide mizgînê
Serkeftin bo te neke şînê
Di dilê me de yî evînê..
Silav li miletê têkoşer
Şervanên mêrxas û şoreşger
Roja azadiyê misoger
Tenê ew dermanê birînê
Kurdaxê Buhişta zemînê
Çiyayê Kurmênc hîmê jînê
Çi dijmin û çeteyên xwînê
Kes nikare te bihejînê
Bûka Rojava va xemilî
Buhar tê diçin derd û gilî
Gulistana çûk û bilbil î
Te hez dikim Yara Gulgulî

Ey leheng

Gava heyvê
Xwe sipart lehengiya te,
Peyvên te
Bi kenê şevê re vêketin…
Gotin: Ey Ahoramezda
Yezdanê hêzê
Biçînî tu tovê
Şîn tê bi destê te şîn tê…
Û niha tu dê yî
Tu bav î…
Ey sermeyandarê mezin
Cîhan li ber te bûye pêtek
Xurirst ava bûye
Qonax bi qonax xwe sipartiye
ser kopalê te…
Ey jîn,
Ey hîn,
Û ey evîn
Germ û serme
Darê xwe li ber te şikandine!
Tirsa qels
Newêrekiya gavan
Nikarin berê xwe
Bidin çiyayê te;
Ey çiya
Ey hêz
Ey birûska peyvê
Navûnîşana te li meydanê
kêferatê e.
Destek bi gurz e,
Destek bi kuling e
Û her destarê dilan
Sawa te dihêre!
Çelengiya te
Mêrxasî
Hevrikê ba û bahozê
Li panava asîmên stûnek li dar
e.
Rojhilat û Rojava
Te dan ser her du qiloçên xwe…
Ey mêj û buhirî
Ey niha
Ey paşeroj
Gulav ji banga te bariya û belav
bû!
Hevîrê jînê
Di koda çavên te de tirş bû…
Li ser kela dilê te, bû nan!
Ey nan
Ey agir
Ey mêrkujê pezkovî;
Ew pezkoviyê ronîkuj!

Awazê di jana birîndar de
kelandî,
û lehiya bêriyên evîndar…
Ey çilka lezgîn
Ey jînxwaz
Bi armanca serketinê
Berê te wa li hêkê ronî bû.
Dara te ber girt,
Doza te zelal bû,
Te kember li pêkenînê pêçand!
Ji denê jînê
Meya serbestiyê te fir kir.
Bawerî, mujde, her bawerî.
Nama te ey mirov,
Nama pîroz
Diyariya rokê hinart!
Diyariya rokê hinart!
Diyariya rokê hinart!



Hinart.. hinart… hinart

Hevala Min

Li bende berbangê,
Roniya sozê û nerîna peymanê
Hevalê … hevalê …
Kengî ew dara
Ko em civandin
Wê qîrîn bike stranê?
Bayê hênik
Çarika bûkaniyê
Ji ser riwê te rakê?
Û heyva çarde şevî
Hêlîna me li sîwana xwe ava
bike?
Hevalê … hevalê …
Kengî
Li fala fincanê
Zar û zêç bêne dîtin?
Û şevîna laleşê
Perestina "feqîr û evdalê"
Bihêre
Evîn û kela germ
Li dilê buhiştê!
Çem û çem
Firişt rê bidin me…
Û sawîrê hezkirinê
Li ser gulên evîndar,
Li buhara em
Lê bûn dost û yar
Asîmanekî vegirê,
Hevalê …
Hevalê …
Kengî
Kew wê hev nekin dehfê?
Bira ji bira kînê neke
Û li hev bikin silavê ?
Ji wan darên cuda
Şaxên"Siyamend û Xecê"
Bibişkivin?
Û tev li hev bibin
Li pizanê yek malzarokê!
Mêrg û çîmen
Li ser dengê me geş bibin,
Êdî nêçîrvan nema ditirsînin
Pezkovî û xezalê
Hevalê …hevalê?

Hetavê

Li ser tîrêjên te,
Ez banga xwe dişînim.
Bi awirên te
Nimêja xwe bi cî tînim.
Hetav e li ser dilê min
Li ser canê min
Kaniyên ko kenê te dîtin,
Gerek nemiçiqin!

Ew destên ko destên te girtin,
Gerek li ser serê şêran nevecî-
niqin!
Evîna me di "kulik*" de ye.
Herdem hêvî di malzaroka
hêviyê de ye.
Hetavê,
Dema em bi hev re bin
Bê pîvan e,
Şev e,
Yan roj e
Bê pê û gav e?
Pêvajoka evîna me,
Bi bihna pûngê dest pê kir.
Di gulzaran de xwedî bû,
Û xwe bi "mehra filan*" girêda!
Hetavê
Li ber deriyê gazinan
Metalan neke!
Meger ji ezmanê bihriyan
Rondik dibarin
Û herdem xunav
Li ser dêmêngulê dilûse.
Bi şev û roj,
Em li bîra hev in,
Û ramanên me
Tu car cotê xwe bernadin.

Tunel

Dengê wê
Bi sîmfoniya
Dengê Arifê Cezîrî re harmonî
dibe.
Silava rojê
Bi tayên tîrêjan re
Gurzan tînin holê
Li ser sêla dilê xwe nanekî
dipêje.
Navekî, şehekî û çavekî
Ji wan pêlên rewrewkê re
Qeyikê li razên roniyê
Li tabloyeke ciwan nexşîn
dike…
Lava xaka tî.
Ji baran
Hêsran dibarîne…
Bigirî baranê bigirî
Nimêja derwêşan
Berzûrî kaniya çavan e;
Pîvongê ji bin girê bêjeyan
hildike…
Destarê behitînê
Li ber çira şevan digerîne…
Li newalên hevokan
Bi şîş û xişta Xoceyan nikildanê
dike…
Li bin hemû tilmên axa sar
Xewnên gorên komel tarûmar
dike...
Li bin berfa peyvan diveşêre..
Ev çi helwest e, çi mebest e
Tu bûyî rûreş û tu bûyî newêrek
Şeva kirîstalî
Te nivêja bêhêvî dikir…
Te xweliya asîmanê bê ber û pal
Bi ser çira şermîn de werdikir…
Weyla li te dunyayê
Ji şima û qişûfê zertir
Tu tinazên xwe zerikî dikî.
Ji rewanê firyayî bêtir
Ji firiştan zûtir
Û ji bihna bayî nûtir
Tu bihna rewan î
Tu dilê firiştan î
Û tu xencer û pêla bayî…
Tu jî gunehên çavan giran dikî

Ji sûra kovanê
Libên kenê jêhatî berhev dikî…
Va bi bihna Zeyzefûnan,
Tu mukur hatî…
Bi bihna Endeko
Tu li min ewle bûyî
Û bi Kovika axînî
Silavên Pilo-pilo
Li ser serê tayên Gelale
Pelikên jîndayî diyar dikî…
Ez jî li te mukur têm
Paçekî spî strana dayika min e.
Buhara keçînî parasta peyva
min e...
Bi çemê şahiya min
Tirêna dilêrî û hogiriyê dime-
şe...
Ji bo te dilê min li ser têtîkan
dikene…
Carekê hêviya pencera dîl û dîn
zindî kir.
Dîmena sîsirkê
Li ser rûyê şevistana kal
Şevên tofanan mukurvanên
pêçekên mendalan,
Li ber firtona (Tisonamî)*
Giryana şahiya derbider,
Wek tabloya "Gornika"
Li ber periya "Pikaso"
Li bin kenê potîna "Naziyan"
dikele!
Weke durvê te
Murala jiyê gulekê,
Erê-na ya ken û girî bi hev re
cot dike…
"Davinşî" zû ji bersivên
"Monalîza" reviya
Ez bi ez re gêj kir;
Tu bi tu re nakokî, navbilî
Û bayê her alî li hevûdu xist.
Ne tirş û şor, tekez pûç û xav û
kelê kir…
Erê ez xerîb im; kor im
Lê ji pirsa çavên te min xwe ava
kir…
Ji sîtava pîr ling ji xêza terpilînê
derbûn…
Hela li wan sozan binêrim,
Çawa dê ji qulên dîwaran der
bibin?
An ji tabloya xwekujînê çawa
direvin?
Te kenê hinara tirş li bin
tepiskên
Hejmara rojên dijwar pijiqand.
Sîstem tevlihev bû
Sînaryoya dubarekirî
Ta bi bihinên sport çikand…
Te kêlên sînorên bê tirazû daçi-
kandin.
Te "kefenên" çavsor
Li ser tilmên tixûban bi destên
Izrayîlan livandin…
Ji te bîr û bawerî peye û keye
Te ew hêlandin,
Dawiya tunelê,
Tarî ji zelaliyê di-ingire!
Sînaryo ya dubarekirî
Hilmekê ji te distîne,
Destê qelew omîda nerînê nika-
re bitevizîne!
Hêla pira rêzê li bahoza qerwelê
şikest.
Êdî li ser banê destpelînê
Şeşrenga xwe danî…
Cil û berg ji ber serma diyalokê
dipoşîne.
Dil bi paçên aramê li dawiya
tunela tarî
Ji zelaliyê her di-ingire.
Lê çi bikim tunel bi dawî nabe?

Dûrî

Ez dûr im û tu jî dûr î, hey Ro-
nak dibêjim te were..
Dengê te li ber guhê min e
Xweş e,
Zîz û zelal e!
Rengê te li ber çavê min e,
Mîna şeva sersal e!
Hey evîn
Şekirê "Şamê" bi me tal e!

Nivîskar Ezîz Xemcivîn di sala 1965'ê de li bajarê Hisiçayê ji dayîk bûye. Di 1985'ê de Peymangeha Elekitrîkê qedandiye.
Di sala 1982'yê de, êdî Ezîz Xemcivîn dest bi nivîsîna bi zimanê kurdî kiriye û di 1990'î de yekem berhema xwe bi navê " A-B eya Kurdî" çap kiriye.
Ezîz Xemcivîn tenê di qada helbestê de nemaye, lê belê pirî celebên wêjeyî yên wekî: roman, rexne, werger, da-nehev û serpêhatî nivîsîne.
Li Rojavayê Kurdistanê, di nava civata rewşenbîr û nivîskaran de bi gelek çalakiyên çandî rabûye û ji bo geşkirin û vejînkirina zimanê kurdî, berdewam xebiti-ye.
Aniha li Başûrê Kurdistanê dijî û 11 berhemên wî yên destexet, ji bo çapkirinê amade ne.



Ez dûr im û tu jî dûr î
Me warê xwe berdaye!
Canê min bû êzing
Dilê te bû agir
Bi xwîna min re geriya
Û rewanê te di ûjdanê min de
meya ye!
Pêlên evîna te
Ez li ber çûm
Wek gawiran ji gemiya "Nûh"
dûr kirime!*
Hey cûdî
Li bextê te me
Li kohê pêsîrên xwe
Ji taloka yezdanan min
biparêze!
Min divê bi wê gerdenê şa
bibim.
Bi bêhna sosinên welatê xwe
şiyar bibim!
Min divê ji gewriya kaniya te
Bi serbestî firek av vexum!

Dizanim tu jî weke min î
Nerîna te li mizgîniya nama min
î,
De were...
De were...
De were…
Va ez jî bi ber te ve têm
Kengî em ê bigihên hev,
Kengî em ê bêriyên xwe bikin
berdêlî?
Bi ken û girî
Pîvanê bişikînin.
Destê te bigirim
Ne xewn be.
Hêviya me pêk bê
Ne guneh be!
Buhara me şîn bê,
Miradê me bi cî bê,
Bila pelê dûriyê bitemire!
Here û bê oxir
Ji navbera dilên me
Bifire û bifire!

www.buyerpress.com
buyerpress buyerpress1
buyerpresss@gmail.com
Whats App00963992238683
bûyer PRESS
Nûçe... Bi Zelalî

Kultûrname

DILQÊ MEDRESEYA KURDÎ DI VÊJEYA KURDÎ DE 1

Zeynulabidîn Zinar

Ji sedên salan ve ye ku ew saziya bi navê Medreseya Kurdî hebûna xwe li nava Kurdan domandiye û ji wan re bûye devera perwerdekirinê.

Ev babet pir fireh e û têgihandina wê ne hêsan e. Ji ber ku serpêhatiya Medreseya Kurdî di dawiya çarîka sedsala bîstê de hate nixumandin û heta niha jî derneketiye holê. Îro jî pir kêm agahdariya zanayên Kurd û Tirk li ser vê saziyê heye û bi awayekî vekirî derbareya wê nizanin.

Lê îro di serê vê sedsala bîst û yekê de, ew Medreseya Kurdî, ew şaxên xwendina ku tê de dihatin kirin, awa û tewrên wê saziyê, ji pir kesan re bûye meraq û gelek mirovên şareza, pispor û hunermend hene ku dixwazin rind babeta wê bizanibin. Lê mixabin heta niha jî, kesî hewl nedaye xwe, û lêkolîn li serê nekiriye. Her çiqasî li ser wê babetê eger hinek tişt hatibin nivîsandin jî, piraniya wan bi kêmasî, bi çewtî û bi awayê sehkirina ji devan çêbûye. Yan jî derheq Medreseya Kurdî de li ser şopa hin baweriyên cuda û bi dîtinên çewt hatiye nivîsandin û ew bi paşverûtî, bi kevneperestî nirxandine. Îcar ji ber hindê min pêwîstiya nivîsandina pirtûkek bi navê Xwendina Medresê dîtiye û ew tiştên ku min bi çavên xwe dîtine ango yazdeh sal jiyana min jî tê de bihurîye, piştre jî ew lêkolînên ku min li serê kirine, bi kurtî nivîsîne û wek pirtûk di 1993'an de li Stockholmê daye çapkirin.

Demekurtek piştî derketina vê pirtûka min a bi navê Xwendina Medresê, bala pir kesan kete ser Medreseya Kurdî û lêpirsîn ji aliyê pir kesan ve lê hate kirin. Ev pirtûk li Zanîngeha Sorbûn (Parîs) û li yeke Londonê jî wek berhema dersê ji bo xwendevanên înglîz û fransiyan hatiye bikaranîn.

Di 1998'an de jî li Parîsê esntîtuyeke Navnetewî bi navê INSTITUT NATIONAL DES LANGUSE ET CIVILISATIONS ORIENTALES, LES ANNALES DE L`AUTRE ISLAM, No 5, kurtiya vê pirtûka min, hem bi zimanê îngilîzî û hem bi zimanê fransî nivîsiye û xistiye nava pirtûkeke 400 rûpelî, bi navê Islam des Kurdes (2) û weşandiye. Her weha wêneyê bergê pirtûka Xwedina Medresê jî li ser bergê Islam des Kurdesê xistine. Piştî vê yekê Medreseya Kurdî hêj zêdetir bala saziyên çandî yên Ewrûpî kişandiye ser xwe.

Herweha wêneyê bergê pirtûka Xwedina Medresê jî li ser bergê pirtûka Islam des Kurdesê hatiye bicihkirin. Piştî derketina vê pirtûkê, îcar hem pirtûka min Xwendina Medresê û hem jî Medreseya Kurdî hêj zêdetir bala saziyên çandeyî yên Ewrûpî hatiye kişandin Medreseya Kurdî ji bo wan bûye mereq...

KARÎKATÊR



Kurdî Xweş e

Agirkuj	اطفاء	Şêwekar	رسام
Xwîner	قارئ	Qalûnkêş	مدخن
Bêjer	خطيب	Bengî	مدمن

Ji Facebookê



Kurdekî devera Palo ya Bakurê Kurdistanê ye. Ev wêne di sala 1890'î de hatiye girtin.

***Ji rûpela lêkolîner Edhem Şêxo .**

Xaçepirs

	1	2	3	4	5	6	7	8	9
1									■
2		■			■				■
3				■		■	■		
4			■						
5		■			■			■	■
6	■				■	■			
7				■			■		
8					■				
9						■			■

Sitûnî

1-Xort – Zana
2-Du tîpên wekhev – Aras vajî
3-Tişta ku mirov her roj dixwe – Mindalên biçûk vajî
4-Dijwateya sitand – Şerbeta ne zelal – Diwateya erê
5-Cînavkeke kesane
6-Du tîpên wekhev – Cînavkeke kesane – Du tîpên wekhev
7- Du tîpên wekhev – Mar belavbûyî – Du tîpên wekhev
8-Masî belavbûyî – Aras vajî
9-Mirovê ku pêwîstiya wî bi avê heye (Vajî) – Mar belavbûyî

ASOYÎ

1-Navçeyeke Efrînê
2-Du tîpên wekhev – Cureyekî çekên kevin
3-Goleke Bakurê Kurdistanê – Du tîpên wekhev
4-Du tîpên wekhev – Pirtûka pîroz a cihûyan
5-Cînavkeke pirsyariyê – Cînavkeke kesane (Pirjimar)
6-Rengek – Sar belavbûyî
7-Feqîr – Cînavkeke kesane – Du tîpên wekhev
8-Dewleta ku Rojhilata Kurdistanê di nava sînorê wê de ye – Germ belavbûyî
9-Raketin – Nêrê çêlekan

Amadekirina Xaçepirsê: Îsa Bavê Siwar

Sitêrname 11

Narîn Omer

Di sala 1943'yê de keçeke dengxweş û hestnazik gundê Poşîtda pîroz kir û ji bo daw û hembêza malbateke kurdên êzidî yên Qefqasyayê hat sipartin; ew keç Zadîna Şekir bû. Çawa ku Zadîna Şekir ji xwe hay bû ku dengê wê xweş e, êdî biryar bi wê yekê da ku miletê wê ji xweşiya dengê wê bêpar nemîne, da ku bi xweşî û bi aramî hestên xwe yên nazik bigihîne dil û ramanên zarên neteweya xwe.

Tevlî kelem, astengî û gotegotên civakê jî, lê belê ew li ser biryara xwe rijd ma û rêya xwe ya huneriyê şopand.

Di destpêka jiyana xwe ya hunerî de, Zadîn xortekî Ermenî nas kir. Bi domana demê re çîroka evîniya wan eşkere bû û tevlî ku malbat û civak bi tevahî dijî wê sekinîn, lê ew li gor daxwaza dilê xwe çû û piştî demeke kin bi hev re şû kirin.

Bi vî hawî dijayetiya gel û civakê lê zortir bû, ji ber ku hevjînê wê ne ji neteweya wê û ne jî ji ola wê bû. Wisa dom kir hetanî ku xwe bi tenê dît; ne malbat, ne mirov, ne dost û ne heval. Sûsika Simo karîbû jiyana xwe bi hevjînê xwe yê Ermenî re berdewam bike û li hember civakê raweste, lê Zadîn nikarîbû bi vê yekê rabe; ew mecbûr bû ku çîroka evîniya xwe bi dawî bike û bendikên di nevbera xwe û hevjînê xwe de biqetîne, da ku bibe dîla keder û xeman û bi tenha xwe pêvajoyên jiyanê berdewam bike.

Zadîna Şekir...Rîtma Sitrana Kurdî

Jiyana Wê ya Hunerî:

Zadîna Şekir di Serdema Hunera Zêrîn de jiyaye(li komarên Yekîtiya Sovyetê). Dema ku derbasî qada hunerê dibe, gelek hunermendên navdar dibîne; yên wekî: Sûska Simo, Fatima Îsa, Egîdê Têcir, Şeroyê Biro, Belga Qado, Aslîka Qadir, Kubara Xido, Kerepêtê Xaço, Bêmalê Keko, Reşîdê Baso û gelekên din….

Çawa ku li ser dika şanoyê disekine û dest bi sitranan dike, êdî nav û dengê wê li seranserî komarên Sovyetê belav dibe. Paşê li gelek komarên Sovyetê şahî vejandin.

Pêwendiyên Wê û Egîdê Cimo:

Piştî ku wê û sazvanê navdar Egîdê Cimo hev nas kir, êdî deriyên navdariyê li pêş wê vebûn...Zadîn û Egîd bi hev re komeke muzîkê ava kir û li pirî komarên Sovyetê şahî li dar xistin.

Hêjayî gotinê ye ku sazvan û dengbêjê kurd ê navdar Egîdê Cimo bi hemî dengbêjên wê demê re hevkarî kiriye; di ahengên wan de beşdar bûye û bi wan re bûye alîkar.

Paşê Zadîna Şekir derbasî Radyoya Êrîvanê bû û çend sitran tomar kirin. Bi vê derbasbûnê re, her wiha bi sitrandina dîrokên folklorî re Zadîna Şekir li ser asta tevahiya Kurdistanê navdar bû.

Hunermenda me ne tenê sitranên kurdî digotin, lê belê ewê bi zimanê Ermenî jî sitran gotine; ji ber ku ew demeke baş mabû

bûka Ermeniyan û evê tiştê bêhtir nav û dengê wê di nav gelan de belav kir.

Sitranên Zadîna Şekir:

Ji bilî folklor, Hunermenda me xudana çend sitranên taybet jî bû. Gelek dîrokên dengbêjiyê gotine, lê bêhtirî xwe bi van sitranên jêrîn navdar bûye: Dêra Zorê Piçûk e, Emer Axa, Eman, Deşt û Zozan, Hesenîko, Lawikê Metînî, Menal û Dê Were...

Dawiya Jiyana Wê:

Zadîna Şekir jî wekî hemî hunermendên hevdemên xwe, tevahiya jiyana xwe kir bi qurbana vejandina huner û folklorê Kurdî. Her timî hewl dida ku bi xweşiya dengê xwe guhdarên xwe dilşad û kêfxweş bike.

Di sala 2008'ê de bi aramî ji nav me bar kir... Bi cendekê xwe ve çû, belam deng û hestên xwe sipart bîrûka hiş û dilê me.

Di baxê dengbêjî û hunera kurdî de dimîne guleke geş. Navê xwe bi tîpên evînê di rûpelên dîroka me de deqand.

Peyva Windayî

Da ku tu peyva windayî bibînî, van navan bi awayekî sitûnî xêz bike:

KOR – BERDA – BERPAL – DÛR – BERTÎL – BEŞGEH – BEST – ALODE – BIJÎN – BERF – KÛT – BERMAK – DERBAR – CÛRE – QOP – DORPÊÇ – ZORDAR – KON – XAL – XÛZ

Peyva Windayî ji 10 tîpan pêk tê, ew jî navê helbestvanekî Kurd ê navdar e.

B	E	Ş	G	E	H	X	D	Û	R
B	E	S	T	Î	A	L	O	D	E
B	E	R	M	A	K	N	K	Û	T
C	Û	R	E	A	B	I	J	Î	N
K	O	N	Ê	B	E	R	T	Î	L
X	A	L	E	D	O	R	P	Ê	Ç
D	E	R	B	A	R	E	Q	O	P
X	Û	Z	M	B	E	R	P	A	L
Z	O	R	D	A	R	E	K	O	R
B	E	R	F	H	B	E	R	D	A

Bersiva Xaçepirsa Hejmara Çûyî

	1	2	3	4	5	6	7	8	9
1	S	O	Z	D	A	R	■	A	V
2	U	■	E	G	M	Î	■	L	A
3	L	A	L	E	■	■	D	Î	L
4	Ê	Z	A	N	G	■	■	K	A
5	M	A	L	■	W	Î	■	A	K
6	A	D	■	H	E	R	Î	R	I
7	N	Î	Ş	A	N	■	R	■	R
8	Î	■	A	R	■	T	E	L	I
9	■	■	D	E	S	T	D	A	N